Kürt Halk Önderi Abdullah Öcalan'a özgürlük kampanyası kapsamında PÇDK tarafından Güney Kürdistan'da yürütülen imza kampanyasına ilgi büyük. Kampanyaya Kürdistan Parlamentosu da destek veriyor. 100 parlamenterin katıldığı kampanyaya imza verenler arasında Federal Kürdistan Başbakanı Neçirvan Barzani de bulunuyor. Toplanan imzalar, parlamenterlerden oluşan bir grup tarafından Kandil'de KCK yetkililerine teslim edildi. Güney Kürdistan Parlamentosu Sivil Toplum ve İnsan Hakları Komisyonu'ndan YNK'li parlamenterler Salar Mahmut, Dane Sait Sofi ve Xelil Osman Hemed Emin, Goran parlamenterleri Viyan Abdurahman, Yekgirtu parlamenterleri Sergul Karadaği'yı KCK Yürütme Konseyi Başkanı Murat Karayılan, KCK Yürütme Konseyi üyeleri Sabri Ok, Sülbüs Peri, Zeki Şengali ve KONGRA

## Parlamento heyeti Kandil'de

GEL Başkanlık Divanı'ndan Hacer Zagros'un bulunduğu heyet karşıladı. Güney Kürdistan Parlamentosu heyeti toplanan imzaların bulunduğu dosyayı KCK Yürütme Konseyi Başkanı Murat Karayılan'a teslim etti. Dosyanın BM, ABD, İngiltere, Fransa, Almanya ve Türkiye Meclislerine de gönderileceği belirtildi.

### Karayılan: Ateşkes çift taraflıdır

Basının yoğun ilgi gösterdiği ziyarette KCK Yürütme Konseyi Başkanı Murat Karayılan heyete teşekkürlerini iletirken, ilk defa Kürdistan Parlamentosu'nun Kandil alanına resmi bir ziyaret gerçekleştirdiğine dikkat çekti. Karayılan, "Ortadoğu'da yaşanan bir savaş gerçekliği var. Bundan dolayı da Kürtler olarak ortak hareket etmeliyiz. Şu anda Türkiye'de bir süreç yaşanmakta. İlan ettiğimiz ateşkes tek taraflı değil, çift taraflıdır. Kimi karakol inşaları ve top atışları çok ciddi bir sorun değil çünkü imha amaçlı değil. Başlatılan bu süreç, halkların kardeşliği için çok ciddi bir projedir" dedi.

### Beş grup ulaştı

Gerilla güçlerinin 8 Mayıs'ta başlayan Demokratik Çözüm Yürüyüşü'nün devam ettiğini belirten Karayılan, "Şu ana kadar 5 grubumuz sorunsuz bir şekilde Medya Savunma Alanlarına ulaştılar" dedi.

### 'Kürtler birlik olmalı'

Kürtler arası birliğin önem-

ine vurgu yapan Karayılan, sözlerine şöyle devam etti: "Lozan'dan itibaren Kürtler parçalanmış, inkar ve imha politikaları uluslararası yürütülmekte. Bu



süreç içerisinde birçok katliam gerçekleşti fakat Kürtler boyun eğmedi ve bugün Kürt mücadelesi ve birliği bir düzeye ulaştı. Kürtlerin birliği ve Kürt sorununun onurlu bir çözümü Kürdistan'ın dört parçası için çok önemlidir."

Karayılan "Barış kendisiyle özgürlüğü getirir. Kürdistan parlamenterleri olarak sizin Kandil alanına gelişinizi çok değerli ve anlamlı görüyoruz" diyerek sözlerini tamamladı.

### Vekil Mahmut: Öcalan serbest kalmalı

Güney Kürdistan Parlamentosu Sivil Toplum ve İnsan Hakları Komisyonu Sözcüsü Salar Mahmut, Kürdistan parlamenterleri adına topladıkları imzaları KCK Yürütme Konseyi Başkanı Murat Karayılan'a teslim ettikten sonra şu konuşmayı yaptı: "Sayın Abdullah Öcalan'a

özgürlük için topladığımız 100 imzayı teslim ediyoruz. Böylelikle çözüm sürecine desteğimizi göstermek istiyoruz. Sayın Abdullah Öcalan 14 yıldır

tutuklu bulunmakta fakat Sayın Öcalan sıradan bir tutuklu değildir. Kürt sorunun çözümü için Sayın Öcalan serbest bırakılmalıdır."

### Savaş 4 parçayı etkiliyor

Türkiye'deki savaşın Güney Kürdistan'ı da etkilediğini belirten Mahmut, "Türkiye'de gelişen savaşın Güney Kürdistan'a etkisi şüphesiz büyüktür. Örneğin; Kandil'deki Kürtler Türk savaş uçakları tarafından vurulmakta, halkımız zarar görmekte yani bu savaş Kürdistan'ın dört parçasındaki Kürtleri de etkilemekte. Türkiye'de yaşayan Kürtlerin haklarına kavuşmalarını umuyoruz. Türkiye'deki Kürt halkına hem anayasal düzeyde hakları verilmesi, hem de Kürt halkı kendi özgür iradeleriyle haklarını savunmalıdırlar. Bunu elde etmeleri için biz de Güney

Kürdistan Parlamenterleri olarak bu imza kampanyasıyla desteğimizi sunuyoruz" diye konuştu.

Güney Kürdistan Parlamentosu heyetinin diğer üyeleri de yaptıkları konuşmalarda süreci desteklediklerini, Güney Kürdistan'da sadece Kürtlerin değil yaşayan bütün halkların temennisinin Kürt sorununun demokratik çözümü olduğunu aktardı.

### Rojava sorusuna yanıt

KCK Yürütme Konseyi Başkanı Murat Karayılan, Güney Kürdistan ve Rojava sınırında yaşanan gerginlikle ilgili bir soru üzerine herkesi daha duyarlı yaklaşım göstermeye çağırarak şöyle dedi: "Yaşanan bazı sorunlar var, bu sorunları Kürtler kendi aralarında çözebilirler. Tutuklamalara ve sınır kapılarının kapatılmasına böylesi bir süreçte hiç gerek yok. Bundan dolayı bu yaşananlar konusunda herkesin daha duyarlı yaklaşmasını diliyorum. Diğer Kürt partilerinin de bu sürece destek vermeleri gerekir. Mesud Barzani Kürtlerin birliği için çabalyor. Biz de bundan dolayı hareket olarak Yüksek Kürt Konseyi'ne destek veriyoruz. En son Hewlêr'de birçok partinin katıldığı bir toplantı yapıldı. O toplantıda Kürtlerin birliği için alınan birçok karar vardı anlaşılıyor ki birbirini doğru anlamama var. İki tarafın da birbirini dinleyip anlaması gerekiyor."

**DİLÂN ŞEVAL/ÇİÇEK  
HELEN/ROSİDA MARDİN /  
ANF/BEHDİNAN**

## Bizava Partiya Kurdistanê

Roja 5'ê Hezîran'a 2010'a li Otêla Mala Badî ji 120 kesayetên konevan û welatparêzên Kurd kombûyînek hat li darxistin. Di encama kombûyîne de 9 kes weke desteye amedakar ji bona ko Partiyêke bi navê Kurdistan damezrênin hat hilbijartin. Koma amedekar civîna xwe a 1'emîn li Tetwanê roja 19'ê Hezîran'a 2010'a de çêkir, xwe weke (Bizava Partiya Kurdistanê) binav kir û xebat û têkiliyên xwe domand.

Di civîna 30.06.2012 de Biryara damezirandina partiyê hatî peji-

destûrê; Binavê Partiya Demokrata Netewiya Kurdistanê amade kir.



randin, koma amedekar reşnivîsa Bernameyê û

Niha rewş di asta tesbîta damezrênerên Par-

tiyê de ye, tesbîta navan tête kirin. Me hevî heye ko her Kurdên Neteweyî di damezrandina vê Partiyê de cîh bigirê. Piştî tesbît kirina damezrêneran dê di demeke nêzik de civînek ji bona li ser bername yê, destûrê, nav û hilbijartina meclîsa partiyê dê nîqaş û gûftugo bête kirin û di encamê de, damezrênerên partî dê bi hev re biryara dawiyê bidin. Bi hevîya Rojên azad û aram û Kurdistanê serbixwe.

22.05.2013

**Bizava Partiya Kurdistanê**

## Divê Kurd fersendan bi kar bînin

AVESTA KURD - Şewirmendê Konseya Ewlekariya Neteweyî ya Kurdistanê Mesrûr Barzanî duh di semînerêka qelebalix de behsa konjunktura siyasî ya Kurdistanê kir û got



carinan fîrset ji kurdan re derketiye lê belê kurd jê re ne amade bûn û carinan jî kurd amade bûn lê belê fîrset ji wan re çênebûye ku di xebata xwe ya neteweyî de bi ser kevin.

Mesrûr Barzanî got îro hem ji kurdan re fîrset hene û hem jî kurd bi xwe amade ne ku van fîrsetan bi kar bînin û got

bidestketeka herî mezin ew e ku kurd di nêv xwe de yekrêz bin digel hebûna mixalefeteke dengbilind.

Di heqê destûra Kurdistanê de jî Mesrûr Barzanî got ew destûra ku heye berê ji aliyê hemî partiyên ve hatiye mînaqêşe kirin û li parlamentoyê jî hatiye qebûl kirin û got divê xelkê Kurdistanê hemî (ne tenê kesên ku nûnerên wan li parlamentoyê hene) di referandumê de dengê xwe bide ka vê destûrê qebûl dike yan na. (Nefel)

<http://www.avestakurd.net/nceyn-rojane/div-kurd-fersendan-bi-kar-bnin-h4287.html>

## YPG: Li Efrînê 28 çekdar hatin kuştin

Efrîn (Rûdaw) – Yekîneyên Parastina Gel (YPG) bi daxuyaniyekê diyar kirin ku di encama şerê ligel komên çekdar de, li Efrînê 28 çekdar hatin kuştin, 3 tang û 6 wesayîten doşka li ser jî hatin rûxandin.



Li gor ANFê, li Gundê Aqîbê yê Efrînê di navbera şervanên YPG û komên çekdar de şer derket. Di encamê de 15 çekdar hatin kuştin, 2 tang û 3 wesayîten doşka li ser hatin rûxandin.

Piştî ku çekdarên xwe girêdayî Artêşa Azad dibînin êrîşî gundê Aqîbê kirin, dîsan di navbera wan û YPG'ê de şer rûda. Navenda Çapemeniya YPG'ê bi daxuyaniyekê diyar kiribû 13 çekdar hatine kuştin, tangek û 3 wesayîten doşka li ser hatine rûxandin. Di şer û pevçûnên navbera YPG û komên çekdar ku heta êvarî dom kir, bi giştî 28 çekdar hatin kuştin, 3 tang û 6 wesayîten doşka li ser hatin rûxandin. Pevçûn hê jî didomin. Li Kobanê benda kontrolê ya Sirîn ket destê YPGê Çavkaniyên YPGê diyar kirin ku benda kontrolê ya nêzî bajarokê Sirînê yê li ser rêya Kobanê jî destê komên çekdar derxistine.

## Komeleyeke Spanî alîkariyê digihîne Qamişlo

Nisêrbîn (Rûdaw/DHA) – Şaredara BDPê ya bajarokê Nisêrbîn a girêdayî Mêrdînê Ayşe Gokkan diyar kir ku ger li Sûriyê tedbîr neyên girtin, wê mirov ne ji birçan ji ber nexweşiyên bimirin.



veger derbasî bajarokê me jî bibin."

Komeleya Tekoşîna li dijî Birçîtiyê ya Spanya, ji bo alîkariyê bigihîne bajarê Qamişlo yê rojavayê Kurdistanê û agehdariyan werbigre, serdana şaredara Nisêrbînê Ayşe Gokkan kirin. Gokkan wiha got: "Ger tedbîr neyên wergirtin, wê mirov ne ji birçîtiyê ji

ber nexweşiyên bimirin. Dibe ku nexweşiyên

û Tuan Jose Tarres serdana şaredara Nisêrbînê Ayşe Gokkan kirin. Armanca serdana şanda Spanî ew bû ji bo alîkariyê bigihînin herêmên şer û rewşa Qamişlo ji nêz ve bizanin bû. Helena Valenciç diyar kir ku ew ji bo alîkariyê bigihînin Qamişlo û di vê derbarê de agehdariyan werbigrin, hatin vir.

Bi armanca alîkariyê bigihînin bajarê Qamişlo yê rojavayê Kurdistanê, nûnerên Komeleya Tekoşîna li dijî Birçîtiyê ya Spanya Helena Valenciç

Ayşe Gokkan jî diyar kir ku zêdetirî 4 mehane li Dergehê Sînorê Nisêrbînê alîkariyên cûr be cûr dişînin û wiha got: "Ev bi hevpariya şaredariya Nisêrbîn û konseya bajêr

**Ayşe Gokkan**

## Obama: Ti şerê me ligel Misilmantiyê nîne

Washington (Rûdaw) – Serokê Amerîka Barack Obama diyar kir ku ti şerê Amerîka ligel Misilmantiyê nîne. Obama got: "Şerê me ligel El-Qaîde, Talîban û hêzên girêdayî wan re heye." Barack Obama li Zanîngeha Parastina Netewî axivî û ragihand ku Amerîka ligel El-Qaîde, Talîban û hêzên girêdayî wan re di rewşa şer de ye. Serokê Amerîka Barack Obama wiha got: "Amerîka ligel Misilmantiyê ne di rewşa şer de ye û ev îdeolojî ji aliyê Misilmanên ku timî rasta êrişên terorîstî tînin ve jî tê red kirin."



## Çiqas raste kesek nizane

AVESTA KURD - Li "Girên Golan"ê, ku di nav sînorê Sûrî de ye, artêşa ku bi rêjimê ve girêdayî ye êrîşê otomobileke leşkerî ya Îsraîl kir.

Her çiqas ku artêşa Îsraîlê vîdîyê rast nebûne jî û derewîn derxistibe jî dîsa di daxuyaniya xwe de got, Îsraîl bi lez bersiva vîdîyê daye û dîsa di daxuyaniyê de hat îdîakirin ku artêşa Îsraîlê bi temamî hedefeke li Sûriyê tune kiriye.



## Tirk çî dixwazin kurd jî wiya dixwazin

Parlamenterê BDPê yê Mêrdînê Ahmet Turk, li Emrîkayê gotiye, "em nabêjin bira di qanûna esasî da tirk, kurd, laz, çerkez were nivîsîn. Dibêjin ku efendim ewê tirkîti here, hûn dixwazin di hemû rûpelên qanûna esasî da tirkîtiyê binivîsin, tu îfrazê me tune. Lê belê em dibêjin ku dibê kulturê çarçihê, nasnameyên çihê jî neyê înkarkirin, were qebûl kirin. Ya na, tu gelseke me bi tirkîtiyê, bi mîletê tirk ra tune. Di nefîceyê da ji xwe ev qanûna esasî ya Komara Tirkîyê ye. Heger hûn hewce dibînin, mafên gelê tirk jî, huqûqê wî jî tîxin wira, lê belê cudahiyan jî înkarkirin."

Axaftinên wiha rebenokî min gelkî aciz dîke, tu dibêjî belkî ji tirkan sedeqeyekê dixwaze.

Tu nabêjî "bira di qanûna esasî da kurd were nivîsîn", lê kurd dibêjin û vîdîyê dixwazê dikin jî. Baş e, heger hebûna kurdan di qanûna esasî da ewê neyê misogerkirin, wê demê em ji dewletê çareseriyê çawa dixwazin? Mafên ku di qanûnan da nehatibin qebûl kirin tu garantiya wan tune. Sibe dikarin ji ortê rakin.

Yanî kurd dibêjin, dibê hebûna me di qanûna esasî da were qebûl kirin. Heger ewê "maf û huqûqa mîletê tirk" tîkeve qanûna esasî, dibê yê mîletê kurd jî

têkevê û wek berpîrsiyar û siyasatmedarekî dibê tu ji bo gelê xwe jî van



mafan bixwazî.

Û "ev qanûna esasî" ne ya Komara Tirkîyê û tirkan tenê ye, heger emê bi hev ra bijînin (ku tu wiya dibêjî) dibê ya me be jî. Loma jî nabe ew çî bixwazin wiya tîxinê, lê em kurd jî wiya qebûl bikin.

Heger kurd û tirk ewê bi hev ra bijînin, dibê qanû-

na esasî jî û qanûnên din jî li gorî hebûna van herdu mîletan û hindikayiyên din bin.

Wek siyasatmedarekî kurd, nabe tu bibêjî "hema cudahiyan înkarkirin", wekî din û hûn çî dinivîsin binivîsin.

Wisa nabe, di demeke wiha dîrokî da, ji ber ku qanûna esasî ya welatekî dike were çêkirin, dibê siyasatmedarên mîletê kurd di daxwazên xwe da gelkî zelal bin.

Em ne mecbûr in ku şik û tirsên tirkan ji ortê rakin û sened û sepelan bidin wan. Em mafên xwe yê hatine xespkirin dixwazin, em dibêjin tirk xwediyê çî mafî bin dibê kurd jî xwediyê eynî mafî bin; ne kême ne jî zêde.

**Zinarê Xamo**

## Bahozê Kampa Domîz da ber xwe

Ba û baraneke diyar bajarê Dihokê vegirt û di encamê de 15 kes birîndar bûn. Xetên elektrîka gelek kolanan jî qetiya.

Rêveberê bîngeha tendirûstiya kampa Domîzê, Dr. Bextiyar Ehmed ji Rûdawê re ragihan: "Di encama firtoneyêke bihêz a şeva din de 11 penaber birîndar bûn. Birîna kesek jî wan metirsîdar e û bilok li serî wî ketiye."



Jêderêkê jî nexweşxaneya beşa lezgîn a Dihokê jî ji Rûdawê re diyar kir ku 4 welaatî li navenda bajarê Dihokê bi heman sedemê birîndar bûne û ji bo nexweşxaneyê hatine şandin û di bin çavdêriya pişîjk de ne.

Li devera Zumar jî, kabîneyek bi ser pêşmergeyêkî de ketiye û birîndar bûye.

Rêveberê belavkirina elektrîka Dihokê Sefer Teyîb jî diyar kir ku bayê postekî elektrîkê xistiye xwar û çend tîlên veguhestina elektrîkê qetiya ne û wiha got: "Eger derfet hebe, em ê îşev çareser bikin û tu kesî bê elektrîk na hêlin." (Rûdaw)

## "Xebata Barzaniyan ji bo hemû Kurdistanê bû"

Di dema merasîma danîna berê bingehîn yê avê li balindeya devera Barzan, serokwezîrê Herêma Kurdistanê gotarek pêşkêş kir û ragihand: "Bi piştevaniya min, karwanê avakirina Kurdistanê naraweste û wê her berdewam be."

Serokê Herêma Kurdistanê Nêçîrvan Barzanî di derbarê nav û xebata Barzan de got: "Ev sed sal in Barzan weke nav ji aliyê hezarên dayik û bavên kurd ve li zarokan tê kirin. Barzan ji bo hemû Kurdistanê zehmetî kişandiye, qurbanî daye û xebatkiriyê."

Di derbarê çanda Barzan de, serokwezîrê Herêma Kurdistanê wiha got: "Rêberên

Barzan xudan bîr û baweriyên yeksanîxwazbûn. Ne xudan serwet û saman bûn, jîngeh û giyan diparastin."

Mele Mistefa Barzanî qet li wê yekê ne digeriya ku şoreşa Îlûnê, şoreşeke navçeyî be

Nêçîrvan Barzanî di derbarê jin û mafên jinê li Barzan de daxuyand: "Cihê şanaziyê ye li Barzan, rê li pêş keç û kuran nehatiye girtin."

Di derbarê firehiya xebata Barzaniyan li Kurdistanê, serokwezîrê Herêma Kurdistanê wiha pêdeçû: "Parçeyeke Kurdistanê nîne ku Barzaniyan xebat tê de ne kiribe û yek aliyê jiyane jî nîne ku Barzaniyan xebat tê de ne kiribe."

Serokwezîrê Herêma Kur-

distanê wiha dirêjî da axaftinên xwe: "Mele Mistefa Barzanî qet li wê yekê ne digeriya ku şoreşa



Îlûnê, şoreşeke navçeyî be, na belê ew kiribû şoreşeke seranserî Kurdistanê Iraqê."

Nêçîrvan Barzanî daxuyand:

"Barzan ne bi hêza çekan bi hêz bûye, pîrriya çekan hêza çekdarî ya Barzan tune bû. Ew yeka ku Barzan bihêz kiriye, baweriya gotinê û hezkirina xelkê ji Barzan û şêxên Barzan re bû." Li kampa Zêwe, mal û

zarokên Barzaniyan bûne armanca firokeyên rejîma Sedam

Serokwezîrê Herêma Kur-

distanê got: "Her ji destpêkê ve Barzan ji bo eşîretê kar ne kiriye, ji ber ku pêkhatiya Barzan ji destpêka pêkhatina xwe ve ji eşîretêkê pîrtir û mezintir bû. Ew pêkhatibû ji eşîretên; Şêwanî, Dolemerî, Mizûrî, Berojî, Nizarî, Gerdî û Herkî binecî."

Di derbarê qurbanîyên Barzan de, serokwezîrê Herêma Kurdistanê Nêçîrvan Barzanî wiha got: "Çendîn kes ji binemalên Şêxên Barzan hatine windakirin, beşek ji wan bi awayekî sistematîk hatin Enfalkirin, weke Anfala 1983an a ku 8 hezar Barzanî bi hev re hatine Enfalkirin."

Li kampa Zêwe, mal û zarokên Barzaniyan bûne armanca firokeyên rejîma Sedam, lê weke nimûneyek û beşek ji berxwedana gelê kurd, ew bihêztir bûn."



## 6.Şandeya BDP a ku wê biçe Îmraliyê diyar bû

AvestaKurd - Hevserokê BDPê Selahattîn Demirtaş anî ziman ku, wana navê kesên ku di nav 6.şandeya BDPê de wê cih bigrin û bi Ocalan re hevdîtîne pêk bînin, pêşkêşî Wezareta Dadê kirine.

Heftêya pêş me şandeyeke nû ji BDPê wê biçe Grava Îmraliyê û bi Rêberê PKKê

Abdullah Ocalan re hevdîtîne bike. Li gorî daxuyaniya ku Hevserokê BDPê Selahattîn Demirtaş di Konferansa Demokrasi û Aştiyê de daye, di nav 6.şandeya BDPê de Hevseroka BDPê Gultan Kişanak jî heye. Şande ligel Kişanak, wê ji Pervîn Buldan û Sirri Sureyya Onder pêk were.

Demirtaş ifade kir ku wana ji bo hevdîtina bi Ocalan re serî li Wezareta Dadê dane û her sê nav pêşkêşî wezaretiyê kirine. Hevseroka BDPê Gultan Kişanak, bi hinceta, "di nav kesên ku gerîla hembêz kirin de bû" ji aliyê hikumetê ve çûyina wê a Îmraliyê nedihate qebûl kirin.

## Li Enqerê Konferansa Demokrasi û Aştiyê pêk tê

AvestaKurd - Li Enqerê li Otelâ Surmeli, di çarçoveya pêvajoya çareserîna pîrgirêka Kurd de "Konferansa Demokrasi û Aştiyê" destpêkir. Gellek kesayetên naskirî di konferansê de cih digrin.

Di çarçoveya pêvajoya çareseriyê de, li ser daxwaza Rêberê PKKê Abdullah Ocalan 4 konferans wê li Enqere, Hewlêr, Amed û Ewropayê pêk bînin. Di vê bergehê de kon-

Ligel Şebnem Korur Fincancı, Murathan Mungan, Arif Sag, Gencay Gursoy, Yakın Erturk, hevserokên BDPê Selahattin Demirtaş û Gultan Kişanak, Hevseroka KCDê Aysel Tuğluk, Hevserokên HDPê (Partiya Demokratîk a Gelan) Fatma Gök û Yavuz Onen, Hevserokên ODPê, Serokê EMEPê, Cigirê Serokê Giştî yê KADEPê û gellek siyasatmedaran li salona konfer-

AVESTA KURD - Hevserokê KCDê Ahmet Türk û parlamenterê PAD yê (Partiya Aştî û Demokrasiyê) Wanê Nazmî Gür dest bi tîkiliyên xwe yê li Washingtonê kirin.

Hevserokê KCDê Ahmet Türk û parlamenterê PAP yê Wanê Nazmî Gür ku ji bo hinek hevdîtinan pêk bînin hatibûn DYEê dest bi tîkiliyên xwe yê li Washingtonê kirin.

Hevserokê KCDê berî ku tevî civîna gel ya li Washingtonê ya ji hêla civaka Kurd ve li otelekê hat sazîkirin de bibe bi nûnerên çapemeniya Tirk ya li Washingtonê hate cem hev û sohbeteke dirêj bi rojnamevanan re pêk anî.

Türk got ku şandeyê roja ewil ya serdanê bi cîgirê Wezareta Derva yê ji karên Ewrope û Asyayê berpîrsiyar Eric S. Rubin, rayedarên maseya Tirkiyeyê yê Wezareta Derva yê DYA û rayedarên Koşka Sipî re hatine cem hev û anî zimên ku rayedarên Amerîkî pêvajoya çareseriyê destek dikin û girîngiyê didin.

Türk anî ziman ku di pêvajoya

## "Em dixwazin Amerîka piştevaniya çareseriyê bike"

çareseriyê de baweriya wan bi hêza gel bixwe heye û got ku: Daxwaza wan ya demokrasiyê ne tenê ji bo

wê çendê ku di mijara çareseriyê pîrgirêka Kurd de ew naxwazin ji derva mudaxele were kirin, çareserî



di hundir de ye. Türk holê got: "Daxwaza me ewe ku DYAê piştevaniyê bide pêvajoya çareseriyê ya li Tirkiyeyê, lewra çareseriyê pîrgirêkê wê demokrasiyê bîne herêmê hemûyê." û holê berdewam kir wî nêrînen xwe yê derbarê wê çendê de bi sazîyên cur be cur yê ramanê re û bi endamên kongreyê re jî parve kirine. Paşê jî Türk û Gür bi endamên civaka Kurd re hatine ba hev û derbarê geşedanên dawî yê li Tirkiyeyê agahî dan û bersiva pîrsên wan dan. Şande wê roja Sêşemê hevdîtînen xwe yê digel Projeya Demokrasiyê ya Rojhilata Navîn (POMED) û Naveda Pêşveçûna Amrîkayê (CAP) bidomîne û wê tevî taştêya ku ji hêla Namik Tan ê Balyozê Tirkiyeyê yê Washingtonê ve were dayîn bibe.

(Ilkehaber)

Mutlu Çiviroğlu / Washington



feransa yekem îro li Enqerê li Otelâ Surmeli destpêkir.

Konferansa Demokrasi û Aştiyê li ser banga Yaşar Kemal, Tarik Ziya Ekinci, Vedat Turkali, Orhan Pamuk, Murathan Mungan, Rakel Dink, Prof. Dr. Yakın Erturk, Prof. Dr. Ioanna Kuçuradi, Prof. Dr. Gençay Gursoy, Prof. Dr. Şebnem Korur Fincancı û Arif Sag, bi beşdariya zêdetirî 400 akademisyen, nivîskar, siyasatmedar, hunermend, aktîvistên tevgera jinan û rewşenbîran îro li Enqereyê destpê kir û wê du roja dewam bike.

ansê cihê xwe girtin.

Dîsa nivîskar Berat Günçikan, rojnamevan Nuray Mert, rojnamevan Ertugrul Mavioglu, rojnamevan Celal Başlangıç, akademisyen Prof. Dr. Ahmet Ozer, hunermend Suavi, parêzer û aktîvist Eşber Yagmurdereli jî tevî konferansê bûn.

Konferansê bi axaftina Parlamenterê BDPê yê Stenbolê Sirri Sureyya Onder destpêkir. Di konferansê de li ser demokratîkbûna Tirkiyê û aştîyê mayînde niqaşên grîng û dîrokî wê bîne kirin.

## Şerê birakujî li Colemêrgê

Şer saet 18.00 dest pê kir û hetanî saet 21ê domand. Ev şerê hanê di navbera eşîra Ertoş û ya Pinyanişê de derket. Sedemê Şer jî, li ser çêreya pêz a li zozanan bû.

Du roj berê şer li zozanê di navbera şivanan de dest pê kiribû û di encamê de şivanek hatibû kuştin.

Roja şemiyê îcar şer ket naveda bajêr. Bi sedan kes jî herdu aliyên ve sûka bajêr jî xwe re kirin qada êrîşê. Her dever bûbû wek roja qiyametê. Ji aliyekî ve berên

yeklepî divirvirîn û ji aliyekî ve terqîn û gurmîna çekan bû, ji aliyekî ve jî qêrîn wêrîna sînyalên makîneyên polîsan bû û hem ava bi şîr bera ser şervanan didan, hem jî gaza îsotê birdidan ser wan.

Bi qederê 9-10 erebeyên pîsan ketibûn nîvê sûkê û nedihîştin ku şervan bigîjin hevûdu. Lê şervanî di kuçeyên teng re çiv li xwe didan û êrîşê hevûdu dikirin.

Saet li dora 21ê şevê şer rawestiya. Lê çend kes li erê



dirêjkirî dihatin dîtin. Ew mîr bûn an birindar bûn, nehat zanîn.

Piştî ku şer rawestiya, dengê sînyala enbulansan hat û li kesên mirî an birindar digeriyan.

Polîsan hetanî derengiya şevê jî nehêla kes li sûkê bigere.

### Barzanî: Divê Ocalan azad be

AvestaKurd - Peyama Serokê Herêma Kurdistanana Federal Mesut greya Netewî a Kurdistanê (KNK) tê lidarxistin. Li çar parçeyên Kur-



Barzanî mora xwe li Kongreya Netewî a Kurdistanê (KNK) xist. Barzanî peyamek ji civîna KNKê re şand û îfade kir ku ji bo serkeftina pêvajoya aştiyê pêwîste Ocalan azad be. Li paytexta Belçîka li Brukselê civîna 13. Destaya Giştî a Kon-

diyar dike, ji bo ku pêvajoya aştiyê bi serkeftî bigihêje encamê, divê Ocalan azad be.

Barzanî di peyama xwe de wiha gotiye: "Pêwîste em ji bo ku pêvajoya hatiye destpêkirin bi serkeve bixebitin. Ez banga her du aliyan jî dikim ku, bila ji bo emcam girtin û serkeftina ev pêvajoya demdrêj hewl bidin. Çimkî aşti, diyalog û têkoşîneke bê şidet, li ber Kurda yekane rêya hevîyên xwe pêk anîne ye. Li Tirkiyê ji bo ku pêvajoya çareseriyê bi serkeve, divê birêz Abdullah Ocalan azad be û di makezagonê de guherîn pêk bê." Serok Barzanî di peyama xwe de bang li hêzên Rojava jî kir û peyama Hewlêrê wek "qezenceke netewî" nirxand. Barzanî di vê mijarê de wiha gotiye: "Ez dixwazim ku bila her kes li gorî peymana Hewlêrê tevbigere û hemû hêz bi bratî alîkariya hev bikin. Li hemberî hev rêbazên fişare û şidetê bikar nînin. Hêvî û daxwaza dijminên Kurdan tam jî ev e ku, Kurd li dijî hev çekan bikarbinin e."

### Barzanî û Beden rewşa Iraqê nirxandin

Serok Barzanî û Cîgirê Serokê Emerîka pêvajoya siyasiya Iraq û navçeyê



nirxandin Joe Biden Cîgirê Serokê Wîlayetên Yekgirtiyê Emerîka li rêya telefonê ve pêwendî bi Mesûd Barzanî Serokê Herêma Kurdistanê kir. Li vê pêwendiyê telefonî da rewşa siyasiya Iraq û navçeyê nirxandin û her du qeyrana siyasiyên Iraq û navçeyê kirin. Her wiha Cîgirê Serokê Emerîka tekez li ser parastin û pêşxistina di navbera Herêma Kurdistan û Emerîkayê kir û ji bo koça dawîya xûşka rêzdar ve pîrse û hevxiyê xwe jî bi Serok Barzanî ragihand.

### Ajansa AA ofîsa xwe li Hewlêrê vedike

AVESTA KURD - Hewlêrê vekin û wê dest Birêvebirê giştî yê Ajansa Anadol ya Tirkiyê Kemal Öztürk li Hewlêrê hev-dîtinêk ligel serokwezîrê Kurdistanê Nêçîrvan Barzanî pêk anî. Öztürk, got ewê ofîseke mezin li



Hewlêrê vekin û wê dest bi weşana kurmancî û soranî bikin, wê weşana wan bê alî be. Barzanî jî aliyê xwe ve kêfxweşiya xwe bi vê gava Ajansa AA anî ziman û got ewê jî ji aliyê xwe ve bibin alîkar.

### Karayilan voleybolê dilîze

AvestaKurd - Nivîskar û rojnamevanê Tirk Hasan Cemal, di di bloga xwe de her roj diweşîne. Hasan Cemal di nivîsa xwe a



qunciknivîsa xwe a îro de qala voleybola ku li Qendîlê, di navbera gerîla û Rêvebirên KCKê de hatiye lîstin dike. Rojnamevanê bi navûdeng Hasan Cemal, ev 2 heftene ku li çiyayên Kurdistanê û Qendîlê vekîşîna gerîlayên PKKê dişopîne û bi gerîla û rêvebirên PKKê re hevdiîtinan lidardixîne.

de pêşbirka voleybolê destpêkir. Cemîl Bayik wek min di nav temaşevanan de cih girt. Karayilan baş dilîze, xwe baş hildide. Ancax Sabri Ok bi bejna xwe a drêj zehf baş dilîze, li ser hev puanan distîne. Cemîl Bayik dibêje, 'kesên ku bi salan li girtîgehê raketibin voleybolê baş dilîzin. Heval Sabri tam 22 sala raketîye... Yê din ew ê bi berçavk e, Fuat, tam 20 sal, 6 meh û 6 roja li girtîgehê raket...'

### PKK li Hewlêrê kampanya înzeyan didomîne

AVESTA KURD - Li başûrê Kurdistanê, li bajarê Hewlêrê, hevalbendên PKK kampanya înzekirina "Azadî ji bo Ocalan" berdewam dikin... Hikûmeta herêma Kurdistanê, ji aliyê xwe ve asayîşa wan diparêze û destûrê dide wan kampanya xwe berdewam bikin.



### Binêrin ev belge çî dibêjin!

AVESTA KURD - Di medyaya Erebî, çend belgeyên balkêş hatine weşandin. Ew belge li ser peymana di navbera PYD û Wezareta Petrolê ya Sûriyê de diaxifin.



AVESTA KURD - Di medyaya Erebî, çend belgeyên balkêş hatine weşandin. Ew belge li ser peymana di navbera PYD û Wezareta Petrolê ya Sûriyê de diaxifin. Li gora belgeyên ku di malpera erebî Kulluna Şurakaa (http://www.all4syria.info/Archive/8

3746) ya navdar de hatiye weşandin, ji bo parastina bîrên (Hêzên ser bi PYD ve) û wezaretê petrolê ya Sûriyê de, peymanek hatiye înzekirin. Li gora wê peymanê jî YPG tê xwestin ku wan bîran biparêze, yanî ne weke ku PYD digot Rimelân hate azadkirin û şeravanên YPG derbasî wê derê bûn. Ev dokumentên nehênî, ku li raya giştî hatine weşandin, gelek rastiyên ku heta niha veşartî mabûn eşkere dike. Sedema ku heta niha PYD ev belge û ew peyman ji Kurdan vedîştartin çî bû? Hîn jî PYD di derbarê van belgeyan de tiştêk negotiye.

### Opozisyona Suriye û helwesta Kurdan

Civîna opozisyonê li Stanbulê berdewam dike, dixweyê aliyên kurd di vê civînê de ne çelakin. Helwesta Kurdan nayê zanîn yan jî aliyên Kurd di vê derbarê de ne zelal in. Civîna opozisyona Suriye li Tirkiyê bajarê

Suriye bike. Seyda partiyên kurd vexwandin civîna opozisyonê. Lê dixweyê tenê hinek partiyên kurd tevî civînê dibin. Ji ber ku di nav xwe de partiyên Kurd di derbara tevlibûna opozisyona Suriye de ne gelekî zelal in.



Satenbulê ji roja dpênçembê destpêkir û dê sê rojan berdewam be. Di opozisyona Suriye de berpîrsê beşê Kurdan Dr. Abdilbasit Seyda ji berî civînê rojekî serdana Hewlêr kir da ku hevdiîtinan li gel partiyên Kurdistanê Herweha wek ENKS tevî civînê nabin û her partiyek bi serê xwe beşdariyê bikin. Lê dixweyê hemû partî jî beşdariyê nakin. Armanek ya civînê ewe ku opozisyon berfirehtir bibê û ji bo vê jî dê hinek aliyên siyasî bikevin di nava opozisyonê de.

### Li Helebê 50 girtî hatine kuştin

AvestaKurd - Li Heleba Suriyê, li girtîgeha Muslumiyyê, di şer û pevçûnên di navbera rejîma Suriyê û hêzên Artêşa Azad de, top li girtîgehê ket û jê 10 Kurd, 50 girtî hatine kuştin. Girtîgeha Muslumiyyê bû hedefa topên rejîma Suriyê û hêzên Artêşa Azad. Di şer û pevçûnên di navbera her du hêzan de top li Girtîgeha Muslumiyyê a li Helebê ket û jê 10 Kurd, 50 girtîyan jiyana xwe ji dest dan. Li gorî ragihandina malbatên girtîyan û şahidên bûyerê, li Helebê di navbera hêzên Artêşa Azad û rejîma Suriyê de şer û pevçûnên dijwar diqewimîn.



Çend navên girtîyên Kurd yên ku li Girtîgeha Muslumiyyê jiyana xwe wenda kirin eşkere bûn: Hesên Beşar, Lewend Hecî û Seydo (paşnav ne diyar e.). Li derdorê girtîgeha Muslumiyyê şerê dijwar yê di navbera her du hêzan de dewam dike. Li girtîgehê bi hezaran girtî hene û malbatên girtîyan bi endîşe ji qetlîfameke muhtemel ditirsîn. Malbatan bang li rêxistinên mafên mirovan yên navneteweyî kirin ku bila vî şerî rawestînin.

## 37 saliya şoreşa Gulanê pîroz be

Îro 37 salvegera dest-pêkirina Şoreşa Gulanê ye. Sala 1975-ê Şoreşa mezin Kurdistanê dike. Fermana rê n Pêşmergeyan dibêjin Bar-



ya di serokatiya Barzaniyê nemir de, li hev kirina herdu sistemên mezin yê cihanî têkçû. Lê têkçûna Şoreşa Îlonê demî bû.

Ji salekî kêmîr Partiya Demokrata Kurdistanê qiyadek demî ava kir û roja 26.Gulanê 1976-ê cardin li çiyayê Kurdistanê bûn dengê gelê xwe û pêşmergeyên Kurdistanê ew hêviyên ku çilmisîn şîn kir ve.

Sala 1975-ê Barzaniyê nemir dixwaze şer bisekinîne. Li ser vê yekê li gel serkirdeyatiya PDK-ê civîne dîke û biryara sekinandina şer didin. Lê Barzaniyê nemir civînekî li gel berpîrsên hêzên pêşmergeyan dike û dixwaze di derbarê berdewam kirin yan jî sekinandina şer de dîtina wan bizanibe.

Di civînê de Barzanî dibêje: "Hun pêşmergeyên qehremanin vî şerî dikin. Ez niha dixwazim bizanim ka dîtina we çiyê? Em vî şerî bisekinînin yan berdeyam bikin. Barzaniyê nemir dirêjahî behsa rewşa herêmê û cihanê dike, behsa rewşa

Kurdistanê dike. Fermana rê n Pêşmergeyan dibêjin Bar-

zanî: Hun çi fermanê bidin emê wê bikin, lê em amadenê şer bikin, lê em dixwazin dîtina cenabê we di vî warî de bizanin.

Barzanî dirêjahî dîtina xwe dibêje di beşek axavtina xwe de di derbarê sekinandina şer de Barzaniyê nemir dibêje: Ez fedekariya pêşmergeyan ji her tiştî çêtir dizanim. Îro rewşa siyasî hatiye guhertin, cihan li kurdan bûye derbek.

Ez jî ne Barzaniyê berê me, ez pîr bûme nexweşim. Wek berê nikarim bigerim û şer bikim. Ez niha du gavan tavêjim diwestim. Eger em şer bikin dê pêşmergeyên qehreman yê qenc piranî bêne kuştin. Hingê dê gelek zehmet be em rojek ji rojan bi hesanî serxweve werin. Lê em şer bisekinînin emê di demê kurd bikaribin cardin berevaniya mîletê xwe bikin.

Li gora vê biryara sekinandina şer tê dayîn û şoreşa Îlonê ji qonexekî derbasî konaxek din dibe. Şoreşa Gulanê dibe berde-wamiya qonaxa duyem ya Şoreşa Îlona pîroz.

## Berazilyayê jî ber xwe da bazarê Kurdistanê

Nêçîrvan Barzanî serokwezîrê Kurdistanê, îro li bajarê Hewlêrê pêşwazî li Enwer Nehas sefirê Berazilyayê li Îraqê kir. Di civînekê de têkeliyên navbera herêma Kurdistanê û Berazilyayê û vekirina konsulxaneyê fexrî ya Berazilyayê li Hewlêrê hatin gotûbêj kirin. Di vê çarçoveyê de sefirê Berazilyayê yê Îraqê got ku, vekirina konsulxaneyê fexrî ya Berazilyayê li Hewlêrê destpêkeke bo vekirina konsulxaneyê giştî û ev yekê jî dê têkeliyên di navbetra Kurdistan û Berazilyayê de ber bi qonaxê nû û pêşkeftî

bibe. Sefirê berazilyayî behsa beşdariya şirket û kampanyên berazilyayî di piroseya avadankirina herêma Kurdistanê de kir û got ku, nuha yek ji baştirîn kompaniyên berazilyayê ku di warê bînasazî de kar dike li herêma Kurdistanê ye. Nêçîrvan Barzanî serokwezîrê Kurdistanê di axaftina xwe de tekîd kir ku, deriyên herêma Kurdistanê bo hemû wan welatên dixwazin li herêma Kurdistanê sermayeyê xwe birazînin vekîrîne. Barzanî got ku, ya ji bo hikûmeta herêma Kurdistanê giring kalîteya karîye ku li gor

standardên cihanî be. Rewşa Îraqê û têkeliyên navbera Hewlêr û

Kurdistanê hertim dixwaze hemû arîşe û pirsgrêk bi rêya diyalog



Bexdayê mijareke din a civîne bû. Di vê çarçoveyê de, Nêçîrvan Barzanî serokwezîrê Kurdistanê behsa helwesta herêma Kurdistanê kir û got ku, herêma

danûstandinan bîn çareser kirin û serdana vê dawiyê ya şandeya herêma Kurdistanê bo Bexdayê li ser baweriya herêma Kurdistanê bi danûstandinan bû.

## "Em êdî naxwazin dayîkên kurd û tirk bigirîn"

AVESTA KURD - Serokê Konseya Rêveber a Koma Civakên Kurdistanê (KCK) Mûrad Karayilan, endamên serokatiya KCKê Cemil Bayik, Sebrî Ok, Sozdar Avesta û Ronahî Serhed ji nivîskarê Tirk Hesên Cemal re axivîn.

Beşek ji nivîsa Hesên Cemal a ligel endamên konseya rêveber a KCKê ku di malpera T24 de hatiye belavkirin bi vî awayî ye.

Mûrad Karayilan: "Em êdî naxwazin dayîkên kurd û tirk bigirîn. Em ji bo bîranîna kesên ji herdu aliyên jiyana xwe ji dest dane, aşî û biratiyê bênin. Ev rastiyeke, leşkerên tîn hemberî me ne dijminê me ne. Dijmin, saziya ku siyaseta înkarkirina kurdan berfirehkiriyê. Ger înkâr biqede, wê bîngê dijmintiyê jî biqede.

Ji bo ji niha û pêde dayîk êşê nekişînin, em di nava hewldanan de ne

Trajediya ku çêbûyî, ji derveyî vîna me çêbûye. Ev çavkaniya xwe ji siyaseta berê ya înkarkirina kurdan digre. Peyama me ji bo dayîkên leşkerên kurê wan jiyana xwe ji dest dayî eve, ev şer ne terciha me bû. Em êdî naxwazin ne dayîkên tirk û ne jî yên kurdan rondikan bibarînin û em naxwazin bigrîn. Kesên ji herdu aliyên jiyana xwe ji dest dane, ji bo bîranîna ciwanên me yê şehîd bûne, em dibêjin were em aşî û biratiyê çêkin. Heta niha tiştê çêbûyî, çêbû. Êdî bila çênebe. Em dibêjin bila aşî û biratî çêbibe. Ji bo ji niha û pêde dayîk êşê nekişînin, em di nava hewldanan de ne.

Aştiya ku me li ser banga Rêber Apo kirî, wê yekê nîşan dide ku em di mijara aştiyê de ciddî û jî dil in. Ger aliyê beramber jî tiştê pêwîst bike, êdî ji vir û şûnde ti dayîkek êşê nakişîne.

Vekişîn wê di nava yek an du mehan de biqede.



Biryara agirbest û pêkanîna wê, biryara vekîşîn û pêkanîna wê, tiştên me kirine. Herdu jî bi hev re dimeşin. Ji 8ê gulanê ve 8 grûb hatine. Di van rojên dawiyê de ji ber barîna barana zêde, kêmtên. Wê meha pêşiya me lez bê dayîn. Demek diyarkirin ne raste. Lê vekîşîn wê di nava yek an du mehan de biqede.

Hikûmet di demê kurd de dikare hinek tiştan bike. Di nava wan de, berdana KCKyîyan. Heta niha kêmt kes hatine berdan. Herwiha li girtîgehê kesên nexweş hene. Dikarin wan berdin... Dikarin yasaya hîlbijartinan biguherînin û benda hîlbijartinê kêmt bikin...

Îro pêvajoya aştiyê bi navendîtiya Rêber Apo tê birêvebirin. Ji bo vê yekê şandek ji Qendîlê, ji KCKê, ji BDPê, ji Mirovên Aqilmend, akademîsyen,

rojnamevan û hunermendan jî bila ligel Rêber Apo bicivin."

Diyariya herî ciwan a ji bo dayîkan çêbûna aştiyê ye

Ronahî Serhat: "Aştî wê bi hewldanên dayîkan bê. Tiştê şer afirandî, zîhniyeta mîrê. Leşker jî zarokên kedkarên zilm dîtine.

Dixwazî tirk an jî kurd, diyariya herî ciwan a ji bo dayîkan çêbûna aştiyê ye. Aştiya bîngêhîn bi hewldanên dayîkan tê."

Cemil Bayik: "Em neçarî şer hatin hiştin. Kes naxwaze şer bike. Di şer de rewşên nedihatî xwestin jî çêbûn. Ger aşî çênebe, ne gengaze mirov bikare tam êşan parve bike. Di bîngêh de dayîk dikarin aştiyê bênin. Divê ji bo vê yekê dayîkên tirkîyê jî ji bo aştiyê tekoşînê bikin."

Divê kurd rêveberiya xwe bikin Sabrî Ok: 23 salan li girtîgehê maye û wiha dibêje: "Pir zehmete mirov hestên dayîkan îfade bike. Bersiva herî baş, çêbûna aştiyekî bi rûmet û ciwan e.

Ger di destûra bîngêhîn de bêjin Tirkîti, divê behsa kurdan jî bikin. Wê demê wê rastiya kurdan jî di destûrê de cih bigre.

Divê kurd xwe bi xwe rêveberiya xwe bikin. Çênebe bêjî, ezê te bi rêve bibim û di rêveberiya te de berdewam bim. Bila kurd xwe rêvebibin.

Sozdar Avesta: Bê şik, êşa herî mezin dixwazî kurd an jî tirk, dayîkan dîtiye. Di nava vê salê de dayîkên kurd li Şirnex, Colemêrg û Dersimê çadir vedan. Em bawer dikin wê hembêzkirina dayîkan ji bo welatiyên Tirkîyê û Kurdistanê bibe despêka biharê. Rûdaw

## Îsraîl: Emê li Sûriyê Esed tercîh bikin

AVESTA KURD - Rayedarê ku navê xwe Rayedarêkî payebilind ê saloxgeriya îsraîlê wiha got; madem ku li Sûriyê îslamparêz desthiladar dibin, baştî Esed desthilatdar be. Lewra Esedekî ku li şuna xwe disekine û bêhêz ji bo me hîn baş e.

Rayedarê îsraîlî daxûyand ku, ger sûriyê di bin desthilatiya serokê dewletê Esed de dewam bike ji bo wan hêj baş e. Herku mîltanên îslamparêz hebin bila Esed hebe. Lewra di rewşek wisa de Esed ji bo hêj çêtir e.

Rayedarê ku navê xwe eşekere nekir di daxûyaniya ku dabû rojnameya "The Times"ê de dax-



uyanîyên girîng dan. Rayedarê îsraîlî got "herku li wê derê yê oldar bihêz dibin û qeyrana li sûriyê kur dibe, em Esedekî ku bêhêz çêtir dibinin. Ji bo berjewendiyên me rejîma esed hêj gunçaw e..."

## 214 endamên PKK tevî YNK bûn

AVESTA KURD - Berpîrsê desteya kargîriya mekteba siyasîya Yekîtiya Niştîmanî ya Kurdistanê, pêşwazî li hejmarekî zor yê Kurdên parçeyên din yê Kurdistanê kir ku çûne nav rêzên YNK'ê.

Li gor nûçeyekî "Ensat Merkezî" ser bi Yekîtiya Niştîmanî ya Kurdistanê ku roja 17/5/2013'an belavkirîye ku 214 kes li parçeyên din yê Kurdistanê ku pêşî li nav rêzên Partiya Karkerên Kurdistanê PKK'ê de bûn biryara xwe dane ku biçin nava rêzên

Yekîtiya Niştîmanî ya Kurdistanê û di çarçoveya wê partiyê de xebata xwe berdewam bikin.

Amaje bi wê yekê jî hatiye kirin ku berpîrsê desteya kargîrî ya mekteba siyasîya Yekîtiya Niştîmanî ya Kurdistanê Mele Bextiyar di rêûrûmekê de ku ji bo pêşwazîkirina wan kesan hatibû rêxistin kirin ragihandiyê û gotiyê: "Em dîroka xebata we bilind dinixînin û rêzê lê digrin, ji berku we li nav Partiya



Karkerên Kurdistanê kar kiriye. Em dilxweşin bi ew ezmûna we ya borî hûn birjînin nava robarê Yekîtiya Niştîmanî ya Kurdistanê, ji

ber ku YNK'ê mala mezine û hewl bo hemû aliyekî dide, li vir hûnê bîr û ramanên xwe bi azadî bidin nîşandan." (rojvakurd)

## Wezîrê derve yê Sûriyê li Bexda ye

Bi serdanekî ji nişka û bêyî agahdariyekî, îro danê sibehê şandeke hikûmeta Sûriyê bi serokatiya wezîrê derve yê Sûriyê Welîd Mûelîm gihişt Iraqê. Biryare ew şand ligel serokwezîrê Iraqê Nûrî Malikî bicive. Endamê lijneya peywendiyên derve yê parlamentoya Iraqê Hesên Xizir Ebas ji Rûdawê re ragihand: "Serdana

wezîrê derve yê Sûriyê bo Iraqê ji bo şewirî û guftûgokirina ligel hikûmeta

Iraqê ya ji bo lidarxistina kongreya navneteweyî ya biyare li ser Sûriyê bê



sazkirin e." Kongreya navneteweyî ya taybet li ser guftûgokirina rewşa niha ya Sûriyê, bi tevlibûna civata asayîşê, Amerîka, Rûsya, gelek welat û aliyên din ligel opozisyona Sûriyê tê lidarxistin. Berî niha jî hikûmeta Iraqê daxwaz kiribû ti welatek destlêwerdanê di karûbarên navxwe yê Sûriyê de neke û divê gelên Sûriyê bi xwe çarenivîsa welatê xwe diyar bikin.

## Zîndana Amedê

Li Amedê du girtîgehên navdar yê ku ketine ser zar û zimanan hene.

Navê ya pêşîn di gelek stranên Kurdî de wek "Hepîsxana Diyarbekirê" derbas dibe. Di nav Kelaya Hundir yan jî bi naveke din Kelaya Biçûk de cî digre. Dîroka çêkirina wê gelek kevn e. Tê tîxmîn kirin ku bi avakirina sûrên kelayê re ev girtîgeh jî hatiye çêkirin. Lewra ji aliyê herkesî ve baş tê zanîn ku desthilatdar ji bo berdwamiya îktîdara xwe, dest bidin ser kuderê, li wê derê wek karê pêşîn hepîsxaneyan lê dikin. Ev girtîgeh jî heta salên 2000-î bi awayekî aktîf girtîyan dihewîne, lê niha ji bo wê bikin muze karên restorasyonê berdewam in.



Receb Dildar  
recebdildar@hotmail.com

Gelek navdarên Kurd di Hepîsxaneyê Diyarbekirê de mane. Ji yê dema nêzik, Melle Mustafa Barzanî û dayika wî, Mehme Arîf Cizrawî û Şêx Seîd di wê hepîsxanê de mane. Dîsa gelek ciwanmêr û mîrxasên Kurd di wê girtîgehê de salên dirêj razane, îşkence dîtine yan jî canê xwe dane. Meriv nikare dîroka wê girtîgehê ji dîroka Kurdan cûda binirxîne.

Navê Hepîsxana Diyarbekirê di gelek stranên de derbas dibe lê strana ku herî zêde bi wê hepîsxanê re bûye yek, strana "Saliho û Nûrê" ye. Ev stran ji aliyê gelek dengbêjan ve hatiye gotin.

Lê mijara me ya îro ne ev girtîgeh e. Mijara me Zîndana Amedê ya nû ye ku di dav xelkê de jê re dibêjin "girtîgeha 5 nolû." Ev zîndan di sala 1980-yî de, piştî darbeya Kenan Evren ji bo girtîyên siyasî hat avakirin û heta niha jî ji bo wê armancê tê bi kar anîn.

Girtîgeh wê çaxê gelek li derveyî bajêr, di nav rezên rojavayê Amedê de hatibû çêkirin. Lê ji ber mezinbûn û firehbûna bajêr, girtîgeh îro di nav navçeya Rezan de maye. Wek abîdeyeke zor û zulmê hîn jî karê xwe dimeşîne.

Ya rast gava meriv navê wê girtîgehê dibihîze, rasterast îşkence û zulm tîn bîra meriv. Kemalîstên Tirk ji Hitler û Mûsolonî çî hîn bibin qat bi qat lê zêde kirine û li ser Kurdan ceribandine. Dewleta Tirk ji bo îşkenceyên sistematîk gelek eskerên pispor perwerde kiribûn û bi hemû hovîtiyên xwe hewl didan ku gelê Kurd li wê derê bêrûmet bikin.

Roma Reş rewşên bîr û serhilderên gelê Kurd li Zîndana Amedê civandibûn û bi zulm û zorê hewldidan ku pêşengên gelê Kurd li wê derê poşmaniya xwe bînin ser ziman ku carek din tu kes li doza gelê Kurd xwedî dernekeve. Ji ber wê jî hemû rê û rêbazên hovane yeko yeko li ser Kurdan dihatin ceribandin. Asta hovîti û îşkenceyan ewqas zêde bû ku ez ne di wê baweriyê de me ku tu nivîskar yan jî rojnameger bikaribe ew îşkenceyên ku li wê derê hatin kirin bi gotinan bînin ser ziman.

Bi dehan kitêb li ser Zîndana Amedê hatine nivîsîn û bi dehan stran li ser Zîndana Amedê hatine gotin lê tu yek ji wan jî nikarin bersiva zûlm û zora li wê derê hatibû kirin bidin. Yê min bi xwe, çî wext we bixwaze ku ez behsa wan rojan bikim, bitenê du dilop hêşir ji çavên min berjêr dibin, lewra behskirina wê derê tiştêkî ji derveyî însaniyetê ye û tu dil nikare xwe li ber çalîkirina wan rojan xwe ragire.

Ya rast Dewleta Tirk hewl da wê nîşka ku pêşengiya gelê Kurd dikir him wek fikr û raman him jî wek fîzîkî tune bike. Dewletê dixwest Kurd vîya bibînin û careke din doza Kurd û Kurdistanê nekin.

Lê Roma Reş bi ser neket, gelek lehengên ku îro di dîroka gelê Kurd cî girtine, bi şewitandina bedena xwe, bi tunekirina canê xwe, vî zulmê qebûl nekirin û di dawiya sala 1983-yan de, piştî ku gelek şehîd li dû xwe hiştin bi serhildaneke mezin, ji wê zulmê re gotin bes e.

Ji bo ev zulm û îşkence hinek sivik bibe heta sala 1984-an girtîyan tam 32 cesed li Zîndana Amedê li dû xwe hiştibûn û ji ber îşkenceyan bi hezaran seqet û nexweşên psîkiyatriyê li dû xwe hiştibûn. Gelek pêşeng û maqûlên Kurdan ji bo rûmeta xwe û gelê xwe nexin bin lîngan li wê zîndana ku li ser dinyê mîna keke weke wê ya din tune ye can dan.

Niha ji bo ev zîndan ji însaniyetê re wek mîrasek bimîne û ev îşkence û zulma wê zîndanê neyên ji bîr kirin, hewldan hene ku wek muze ji nû ve were restore kirin. Ev daxwaza gelê Kurd e. Ji bo wê daxwazê di 30-yê îlonê de li Amedê xwepêşandaneke hat li dar xistin û bi hezaran kes bi ser zulma Roma Reş ve qîriyan.

Lê Dewleta Tirk wek hercar, ji bo şopa zulma xwe veşêre dixwaze wê zîndanê xera bike û navê wê ji dîroka rake.

Divê Zîndana Amedê xera nebe û Kurd îşkence û zulma dewleta Tirk tu carî ji bîr nekin.

Divê Kurd wê rûreşiya li ser Kurdan hat meşandin ji bîr nekin.

Divê Kurd Zîndana Amedê wek xaleke reş her tim bibîr bînin ku nîşên nû bizanibin çî hatiye serê gelê Kurd û bi wî awayî li sîberoya xwe bifikirin.

## Îmralî dibe baregehek siyasî

Li ser daxwaziya Ocalan 8 girtiyên din yê PKKê rêdikin Îmralî. Wek tê zanîn sala 2009ê ji bû Ocalan tenê nemîne 5 girtî rêkirin girava Îmralî. 4 ji wan girtiyên doza PKKê û yek jî ji doza rêxistina çepên Tirk TIKO bû.

Ji berî demekî Ocalan da xuyakirin ku hêdî wan 5 girtiyên li Îmralî naxwaze. Li ser vî yekê serokwezîrê Tirkiye Tayîb Erdogan

axavtinek ya xwe de gotibû: Ji bû tenê nemîne me hinek girtî rêkirin Îmralî. Niha jî dixwaze ew girtî ji Îmralî herin.

Lê di demek nêzik 8 girtiyên din yê doza PKKê rêdikin Îmralî. Ev kes dêji aliyê Ocalan ve bînin destnîşankirin, piştî erêkirina wezîrê Dadê wan dibin Îmralî. 4 ji wan jinên û 4ên din jî mîrin.

Dixwêyê Îmralî ji girtîgehê zede-

tir dibê baregehek siyasî ji bo pêwendiyên li gel dezgehên dewletê û rêvebirina tevgera PKKê. Li ser vî yekê gelek şiroveyên cuda tînin kirin.



Wek ku tê zanîn li Başûrê Rojavaya Kurdistanê şoreşek ku hîn didome heye. Rejîma BAAsa xwînrij di demên xwe yê dawî de ye. Heta berî çend hefteyan jî di nûçeyande Rojava her tim di pêşîde bû. Divê wiha bûna jî. Lê di demên dawî de, bi taybetî jî piştî hevdiştinên dewlet û Ocalanê êdî di nûçeyande cih nadin Rojava. Hat xwestin ku şoreşa li Rojava didome paşve bê avêtin.

Bêgûman ev xeletiyek mezin e. Ji ber ku hin alî nexwazin jî heta



asteng jî bikin divê rewşa Rojava her tim di rojevêde be. Bi pêşketina teknolojîyê derfet hene ku rewşa Rojava bê şopandin. Derfet hene ku beyî daxuyaniyên partiyên an daxuyaniyên 'serokan', mirov rasterast ji gelê ku li wir dijî rewşê hîn bibe.

Belê, em çima tiştêk ku pêkan û hêsan e nakin an nikarin bikin?

Li gor min bersiva vî pirsê diyar û zelal e:

Hêzên din nav me de û ê ji dervî me ku naxwazin Rojava di rojevêde be, naxwazin Kurd di Rojava de destkeftinek bi dest nexer. Ji berk u

## Projeya aşitiyê projeya Tirkîyeyê bûnê ye

dixwazin projeyek ku jê re dibêjin "projeya aşitiyê" bidin destpê kirin (projeya aşitiyê tenê û tenê projeya Tirkîyeyê bûnê ye) û Bakûrê Kurdistanê bi temamî tîxin bin bandora xwe. Bi wî awayî dixwazin bi hêz û piştgiyariya ku ji Bakûr bigirin, pêşî li pêldan a Ala Rengîn li Rojava bigirin. Ez bawer im mirovên ku ji siyasîyê piçek fehm dikin, wê projeyê bi hêsanî dibînin.

Ji bo nehêlin ev proje biserkeve û Kurd mafê xwe yê çarenivîsîyê bidestbixin divê em çî bikin?

Ger vana xal bi xal binivîsin:

1-) Divê em li her derê eşkere bînin ziman ku em Kurd netewek in, Sûriya, Tirkiye û İnan li Kurdistanê dagirker in ( hewce nake em Başûr binivîsin. Ji berk u ew der azad e), ziman û çandek me yê dewlemdar hêye û em xwedî dîrokek dirêjin.

2-) Divê em rasterast bînin ziman ku li cihanê mafên netewên din çî bin (bi taybetî jî dewletbûn) mafên Kurdan jî ew bin. Divê vî tiştî hew di gotinê de nehêlin û li gpr wê jî tevbigerin, gavan bavêjin.

3-) Divê em eşkere û bêtîrs piştgirî bidin şoreşa netewî ya Rojava û divê ew jî ne tenê di axaftinê de bimîne bi rastî jî piştgirî bidin.

4-) Divê em ji ciwanê Rojavayê ku ji bo mafên netewî tîdikoşin diyar bikin ku ew ne tenêne, pêşeroja me bi hev ve girêdayî ye û em amadene ku divê tîkoşîna netewî de çî bikeve ser milên me bikin.

5-) Divê em eşkere seknek li dijî PKK/PYD yê ku dixwaze pêşî li

kesên ku ji bo mafê çarenivîsîyê (mafê dewletbûnê) tîdikoşin bigire, nîşan bidin.

6-) Divê di nav rêxistinên ciwanan ên her çar perçeyên Kurdistanê, li ser bîngehek netewî yekîtiyek bê avakirin. Divê em biryarên Konferansa Ciwanan bînin cih û konferansê bikin kongir ku di nav ciwanan de yekîtiyek netewî avakin.

7-) Divê li dijî lîstika kul i Bakûrê Kurdistanê di navbera dewlet û Ocalan tê lîstin (a rast dewlet nivîsandiye û derhêner e, Ocalan jî lîstikvan) helwestek eşkere bê nîşandan. Ji berk u dixwazin bi vî projeyê Kurda bê statu bihêlin û di bin navê "Tirkîyeyîbûnê", "aşitiyek" "bi darê zorê" çêkin. Helbet bikarnameyîna çekan û nîmirina ciwanan cihê kîfxweşiyê ye. Lê divê em fehm bikin ku ev proje projeya bêstatu hiştina Kurda ye.

